*e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi/Journal of Oriental Scientific Research (JOSR)*
*ISSN:1308-9633*
*Nisan-2018 Cilt:10 Sayı:1(19)/April-2018 Volume:10 Issue:1 (19) Sayfa:471-485*

# SERBORIYA AKADEMIYA KURDÎ LI TIRKIYEYÊ Û PIRSGIRÊKÊN WÊ*

**Necat KESKİN****

**Kurte**

Akademî, îro hem ji bo mekânên ku di sehayên zanistî de perwerdeyê didin, û hem jî ji bo civaka têkildarî xebatan zanistî tê bikaranîn. Di vê çarçoveyê de saziyên têkildarî xebatên kurdî ku di salên dawî de hatine avakirin û hebûna lêkolînerên di bin banê van saziyan de xebatên xwe dimeşînin rê dide ku mirov li Tirkiyeyê behsa akademiyeke kurdî bike. Mijara vê xebatê jî, li ser vê esasê, enstîtuyên zimanên zindî yên girêdayî Zanîngeha Mardîn Artuklu, Bîngol û Wan Yuzuncu Yilê ne ku îro di qada xebatên kurdî de cihekî girîng digirin. Di xebatê de ev sazî û civak wek "destpêk"a akademiya kurdî ya li Tirkiyeyê tên nirxandin. Ji ber vê yekê jî rûbirûyê hinek pirsgirêkan tên. Armanca vê xebatê jî ew e ku rewş û pirsgirêkên akademiya kurdî tevî pêvajoya avakirina wê destnîşan bike. Ji bo vê yekê jî, ji çavkaniyên nivîskî û dijîtal û her weha ji çavdêrî û hevpeyvînan jî sûd hatiye wergirtin.

**Bêjeyên sereke:** Akademî, kurdî, xebatên kurdî, Enstîtuyên zimanên zindî, Tirkiye.

## TÜRKİYE'DE KÜRTÇE AKADEMİNİN SERENECAMI VE SORUNLARI

**Öz**

Günümüzde akademi, hem bilim alanlarında eğitimin yapıldığı mekân anlamında hem de bilimsel çalışmalarla ilişkili topluluk anlamında kullanılmaktadır. Bu çerçevede son yıllarda açılan Kürtçe çalışmaları ile ilgili kurumlar ve bu kurumlar arasında çalışma yapan kişilerin varlığı Türkiye'de bir Kürtçe akademiden bahsedilebilmesine olanak vermektedir. Bu çalışmanın konusu da, bu temelde, Kürt çalışmaları sahasında önemli bir yer tutan Mardin Artuklu, Bingöl ve Van Yüzüncü Yıl üniversitelerine bağlı Yaşayan Diller Enstitüleridir. Bu çalışmada, bu kurumlar ve topluluk Türkiye'deki Kürtçe akademide bir "başlangıç" olarak değerlendirilmektedir. Bu nedenle de bu kurumlar bazı sorunlarla karşılaşmaktadırlar. Bu çalışmanın amacı da, kuruluş süreci ile beraber Kürtçe akademinin durumunu ve sorunlarını betimlemektir. Bunun için de, yazılı ve dijital kaynaklardan, ve aynı zamanda gözlem ve görüşmelerden de yararlanılmıştır.

---

Makale Gönderim Tarihi: 23.12.2017, Kabul Tarihi: 30.03.2018
Doi: 10.26791/sarkiat.370336

* Ev gotar jinûvesazkirin û nivîsandina beşeke teblîxa bi navê "Rewşa Akademî û Weşangeriya Akademîk a Kurdî li Tirkiyeyê" ye ku di konferansa bi navê "First Biennial Conference of IISKSK/Frankfurt" (16-19 Îlon, 2017) de hatiye pêşkêşkirin. Teblix an jî beşen teblixê nehatine çapkirin.

** Dr., Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, necatkeskin@gmail.com

**Anahtar Kelimeler:** Akademi, Kürtçe, Kürt çalışmaları, Yaşayan Diller Enstitüsü, Türkiye

**THE EXPERIENCE OF KURDISH ACADEMY IN TURKEY AND ITS PROBLEMS**

**Abstract**

Today, academia is used both in the sense of space where education is conducted in science fields and in the sense of community related to scientific studies. In this context, the institutions which are related to Kurdish studies and opened in recent years and the presence of people who work in these institutions enable to mention about a Kurdish academy in Turkey. The subject of this study is, on this basis, the Living Language Institutes of Mardin Artuklu, Bingöl and Van Yüzüncü Yıl universities, which have an important place in the field of Kurdish studies. In this study, these institutions and academies are evaluated as "beginning" of Kurdish academy in Turkey. Because of that, they face some problems. Thus, the purpose of this study is to describe the situation of Kurdish academy and its problems together with the establishment process. For this purpose, written and digital sources have been utilized as well as observations and negotiations.

**Keywords:** Academy, Kurdish, Kurdish studies, Living Language Intitute, Turkey

**Destpêk:**

Akademiya, ji peyva grekî *Akademeia*yê tê ku wateya wê "cihê akademos"ê ye ku ew jî lehengekî Atînayî ye. Peyv piştre ji bo bexçeyê ku Platon lê dersên xwe dide tê bikaranîn. Peyv di serdema navîn de ji frensî derbasî ingilîzî dibe û di sedsala 15 û 16emîn de ji bo mekanên perwerdeya huner, zanist an jî perwerdeya bilind tê bikaranîn.[1] Di vê demê de ji bo pêşxistina huner û zanistê li pey hev mekanên bi navên akademiyan tên vekirin ku ji bo kesên derve girtî ne (Vergin 1999: 43-44). Li gorî Baltes (1993:5), hemû akademiyên modern bingeha xwe ji *Academia Platonica* digirin ku ji hêla Cosimode' Medici ve li Floransayê di sala 1460î de hatiye damezrandin. Medici jî akademiya xwe li ser bingeha akademiya Platon damezrandibû. Wateya wê di ferhenga oxfordê de jî bi vî awayî ye; "*Civak an jî enstîtuya akademisyen û hunermend an jî zanyarên navdar ku di sehayeke taybet de pêşxistin û domandina standartan ji xwe re dike armanc*".[2]

Di vê çarçoveyê de, beşên ziman û edebiyata kurdî yên enstîtuyên *zimanên zindî* rê dide ku mirov li Tirkiyeyê behsa *akademiyeke kurdî* bike. Ji akademiya kurdî mebest ew e ku vekolîn û lêgerinên derbarê ziman, edebiyat û çanda kurdî de bi zimanê kurdî, bi navê kurdî, bi rêbazên zanistî bên kirin. Ev yek jî îro li Tirkiyeyê bêhtir di bin banê Enstîtuyên Zimanên Zindî û beşên Ziman û Edebiyata Kurdî/ Ziman û Çanda Kurdî de tên kirin ku tenê li Zanîngehên herêmên "kurdnişîn" in.

Serboriya akademiya kurdî ya li Tirkiyeyê mijara sereke ya vê xebatê ye. Di vê çarçoveyê de dê bi awayekî giştî li ser pêvajoya xebatên kurdî heta pêkhatina akademiya kurdî li Tirkiyeyê û her wiha dê li ser pirsgirêkên heyî jî bê rawestandin.

[1] Ji bo wate û etîmolojiya peyvê bnr. https://www.etymonline.com/word/academy (21.12.2017)
[2] https://en.oxforddictionaries.com/definition/us/academy (21.12.2017)

Armanca sereke ya vê xebatê jî teswîrkirina wêneyê giştî yê serboriya akademiya kurdî û pirsgirêkên wê li Tirkiyeyê ye. Loma xebat xwe ji hurgûlî û detayên derbarê mijarên wek metodolojî, ziman, termînolojî dide paş û dixwaze wêneyekî giştî yê *akademiya kurdî* li Tirkiyeyê bikişîne û bi vî rengî rêya xebatên li ser detayan hûr dibin vebike.

Wek rêbaz, ligel çavkaniyên çapkirî û yên dijîtal, ji bo rewşa Enstîtuyên Zimanên Zindî û beşên kurdî yên di van Enstîtuyan de cih digirin bi rêvebir an jî mamosteyan re bi riya maîlan an jî rasterast têkilî hatine dayîn û agahî ji wan hatine wergirtin. Ev agahiyên hejmarî û tabloyên di nav gotarê de bêhtir li ser bingeha van hevnivîsandinên li ser maîlan û bersivên rêvebir an jî xebatkarên enstîtuyan hatine amadekirin. Her weha, wek mamosteyekî beşa kurdî ya Enstîtuya Zimanê Zindî tecrûbeyên şexsî û çavdêriyên nivîskar jî di amadekirina vê xebatê de cih girtine. Rewşa ziman, edebiyat û çanda kurdî û bi taybetî jî rewşa akademiya kurdî ya Tirkiyeyê têkildarî rewşa polîtîk ya gelemperî ye û ji ber vê yekê jî pêwîstî bi kurtenêrîneke giştî li ser xebatên kurdî û rewşa kurdî ya giştî - heta avakirina enstîtuyên zimanên zindî- ligel rewşa polîtîk heye.

## 1.Kurtenêrînek li ser rewşa polîtîk a kurdî û serboriya xebatên kurdî li Tirkiyeyê

Komara Tirkiyeyê ku li ser hişmendiyeke modernîst wek netewe-dewlet hatiye avakirin-her çiqasî di serî de wisa xuya neke jî- li ser *yek*bûnekê ava bû.[3] Di vê hişmendiyê de, li gorî rêvebirên demê û îdeolojiya wan, ji bo avakirina neteweyekê hin pêwîstî hebûn, ku ew jî di her warî de *yekkirinek* bû. Ev îdeolojiya netewe-dewletê ya neteweperest ku wek *îdeolojiya komarî* jî tê binavkirin (Aydın 2000) bêhtir bi riya perwerdeyê, ku ji bo avakirina ziman û çandeke nû dibû bingeh û dîsa bi riya hin çalakiyên din, ango şoreşên (an jî inqilab) komarê, di nav civakê de hat belavkirin.[4] Dikare bê gotin ku ji van reform an jî *şoreş-inqilab*[5]an armanc ew bû ku di axa ku ji Împeratoriya Osmanî maye de netewe-dewleteke nû bê avakirin.

Her çiqasî di serî de ew qasî eşkere nebe jî, ev helwest piştî salên 1930î bi tez û teoriyên bi navê *teza dîrokê ya tirk* (Türk Tarih Tezi) û *teoriya roj-ziman* (Güneş-Dil teorisi) bi awayekî eşkere derket ser ruyê erdê û di hemû sazî û bernameyên dewletê de jî cih girt.

Li gorî van tez û teoriyan *Tirk* neteweyeke avakarê medeniyete bûn, sumer, hîtît û akad hemu tirk bûn, tirkan medeniyet li dinyayê belav kiribûn; û ji aliyê din ve

---

[3] Wek mînak; ligel ku di makeqanûna 1921ê de îfadeyên wek "zimanê fermî", derbdayîna pênaseya "tirk" tune bû, di ya 1924an de ev derdikevin meydanê. Ji bo ya 1921ê bnr: http://www.anayasa.gen.tr/1921-tek-orijinal.pdf 12.08.2017; û ji bo ya 1924an bnr: http://www.anayasa.gen.tr/1924tek.htm 12.08.2017; û ji bo berawirdkirina makeqanûnên Tirkiyeyê bnr: http://www.adalet.gov.tr/duyurular/2011/eylul/anayasalar/1982.pdf 12.08.2017

[4] Dibistan û perwerde di vê pêvajoyê de cihekî girîng digire. Wek ku Beltekîn di xebata xwe de tîne ziman; "…avakarên Komarê perwerde di înşakirina civaka Komarê ya nû de wek amûreke girîng saz kiribûn" (2014: 18).

[5] Di tirkî de her dû peyv jî têb bikaranîn. Tercîhkirina bikaranîna van peyvan têkildarî nêrîn û sekna kes(an) xuya dike. Lê li vir ji bo kirpandina dualîbuna bikaranîna van peyvan her du peyv jî hatine nivîsîn.

bingeha hemû zimanan jî, bi taybetî jî yên Indo-ewropî, zimanê tirkî bû (bnr. Afet İnan 1930).[6] Loma divê zimanê tirkî derketiba pêş û bibûya serdest.

Di vir de ya herî berbiçav jî qedexekirina zimanên din bû ku yê sereke zimanê kurdî bû. Ligel ku di berxwedana li himber dagirkeran û di avakirina dewletê de rêjeyeke berbiçav ji axa û şêxên kurdan piştgirî dabe Mustafa Kemal û hevalên wî jî, piştî rizgarîyê kurdan mafê xwe yê nasnameyî bi dest nexist û berevajî vê jî wek tehdîteke li himberî bingeha netewe-dewleta nû hatin dîtin.

Kurd û kurdî û tiştên bi kurdî ve girêdayî di vê pergalê de winda bûn. Kurd ne wek gelekî xwedî nasname û çandeke cuda lê wek *qismekî paşdemayî* yê tirkan hat dîtin û vê yekê wisa dewam kir. Berxwedan an jî serhildanên rûdidan jî wek *eşqiyatî* dihatin binavkirin. Ev yek di rojnameyên wê demê de jî bi hesanî dikare bê dîtin (Bnr. Bruinessen 1992: 362-363/372). Piştî têkçûn an jî têkbirina van serhildanan, li Tirkiyeyê demeke dirêj di warê *kurdîtî*yê de bêdengiyek çêbû. Ev bêdengî bi tevgera Barzanî ya li Kurdistana Iraqê hinekî belav bû û di nav rewşenbîr an jî xwendevanên kurdên Tirkiyeyê de jî kelecanek çê kir ku vê yekê di *bûyera 49an* de mirov bi eşkere dikare bibîne (Anter 1999:149-151; Alkış 2010; Kaya 2012: 81-93).

Piştî darbeya leşkerî ya 27ê Gulan a sala 1961ê îzafî be jî rewşeke demokratîk li Tirkiyeyê derket holê û piştî vê rewşê jî wek ku tê zanîn Partiya Karkeran ya Tirkiyeyê (TİP) hate damezrandin û hinek kurdên çepgir, demokrat an jî rewşenbîr jî di nav vê partiye de cihê xwe girtin.[7]Gava li Tirkiyeyê ev bûyer diqewimîn, di heman demê de li Iraqê jî tevgera Barzanî (an jî şoreş) careke din dest pê dikir (bnr. Sungur 2007) û di nav hemû kurdan de jî deng dida ku rê li damezrandina *Partiya Demokratîk a Kurdistan a Tirkiyêyê* (TKDP) vekir. Cihgirtina kurdan di nav TİPê de; damezrandina TKDP û buyerên wek *xwepêşandanên rojhilat* (Doğu Mitingleri) rê li damezrandina komeleyên kurdan vekirin ku ya pêşî jî wek tê zanîn DDKO (Doğu Devrimci Kültür Ocakları-Ocaxên Çandî Şoreşger ên Rojhilat) bû (bnr. Beşikçi 2011/2017; Çal 2014).[8]

Xebatên kurdan ên polîtîk ku di nav xwe de kêm be jî xebatên çandî, xebatên li ser ziman û edebiyatê jî dihewandin heta darbeya leşkerî ya 12ê Îlona 1980î bi awayekî curbicur dewam kirin û di nav kurdan de belav bûn.

Darbeya leşkerî ya 12ê Îlonê bandor li ser hemû çalakiyên polîtîk, civakî û çandî kir an jî çalakiyên hene jî qut kir.[9]Gelek rewşenbîrên kurdan berê xwe dan Ewrûpayê û li wir xebatên xwe dewam kirin. Ji aliyekî ve jî tezên dewletê yên berê ku digotin kurd tune ne, careke din bi tundî ketin rojevê. Li gorî vê nêrînê kurd ne ku tune bûn, ew wek qewmeke tirkan her hebûn, lê ji ber ku cihê wan her berf bû, gava li ser berfê dimeşiyan dikirin *kart, kurt* ku ev jî bi demê re bûbû navê wan û ji hêla emperyalîstan ve jî dihatin bikaranîn. Ev tez ji hêla cuntaya

[6] Li ser van "tez"an ji bo xebateke rexneyî bnr. Beşikçi (1986).

[7] Bozarslan, tevgera kurdan a salên dest pê kiriye bi têkiliya "çep" dinirxîne û dibêje bêyî aliyê wê ye çep an jî vê têkiliyê famkirina tevgera kurdan ya ji salên 60î heta îro zehmet e. Bnr. Bozarslan 2013; 9-69.

[8] Ji bo analîzeke ewil a li ser *xwepêşandanan rojhilat* (Doğu Mitingleri) bnr. Beşikçi, 2014; Di salên dawî derbarê vê pêvajoyê de hin tez jî hatine amadekirin. Bo mînak bnr. Gündoğan, 2005.

[9] Wek mînak Kovara Tîrêj a çandî ku di sala 1979an de li îzmîrê dest bi weşanê kiribu û li wir dihat çapkirin, ji ber darbeya leşkeri hejmara dawî –tevde çar hejmar derketine- li Stockholmê hat çapkirin. Ji bo pêvajoya weşangeriya kurdî li Tirkiyeyê û pirsgirêkên rubirû bûye bnr. Malmîsanij & Lewendî (1992); Malmîsanij (2007:33-57).

leşkeri ve hat pêşkêşkirin û ji hêla akademîsyenan ve jî hat pesendkirin û belav bû. Kurdî û her tiştê têkildarî kurdî hat qedexekirin. Di nav vê rewşa civakî, polîtîk û akademîk de di sala 1984an de PKK tevgera çekdarî da destpêkirin ku bandor li ser hemû xalên bi kurdî ve têkildar kir heta salên 1990î.

Di sala 1991ê de, serokkomar Turgut Ozal ji raya giştî re vekirî got ku kurd hene û pirsgirêka kurdî jî heye. Di heman salê de jî qanûna bihejmara 2932 hat betalkirin ku li gorî vê qanûnê zimanê hemwelatiyên Tirkiyeyê tirkî bû û îfadekirin û weşanên bi zimanên *ne-tirkî* qedexe bûn.[10] Piştî vê betalkirina qanûna navborî *kesên zimanê wan ne tirkî* ye dikarîbûn zimanê xwe –lê ne di fermiyetê de- bi kar bînin. Di vê demê de, xebatên çandî, avakirina saziyan û weşana rojname û kovarên kurdî jî dest pê kirin. MKM (Mezopotamya Kültür Merkezi) an jî Navenda Çanda Mezopotamya (NÇM), kovarên wek *Deng* û *Rewşen*, *Nûbihar*, rojnameyên wek *Yeni Ülke*, *Özgür Ülke* hinek ji van komele, kovar û rojnameyan in. Bêguman ev tiştên ku tên gotin ne di rojekê de û ne ji ber xwe ve derketin holê û hemû jî bi rewş û tevgera polîtîk ya kurdan hemûyan ve girêdayî bû.

Di heman demê de weşanxaneyên kurdî jî vebûn û di nav weşanên van weşanxaneyan de gelek pirtûkên lêkolînên derbarê kurdî û kurdan de derketin. *Deng*, *Nûbihar*, *Avesta*, *Beybûn*, *Öz-ge* û *Komal* mînakên weşanxaneyan in ku di van salan de hatine damezrandin. Ji nav wan *Nûbihar* û *Avesta* heta îro jî karê xwe didomînin. Tiştekî din jî di derbarê van çalakiyan de ku divê bê gotin ew e ku, ew sazî, weşanxane û rojnameyên navborî her wext di bin zextên dadgehan de bûn, gelek doz li ser wan hatin vekirin, gelek ceza dan wan heta gihaştina roja îro.

Wek di serî de jî amaje pê hatibû kirin, rewşa kurdî, edebiyat, zanîn û akademiya kurdî têkildarî rewşa polîtîk ya gelemperî ye û ev yek careke din di destpêka salên 2000î de jî dikare bê dîtin. Girtina serokê PKKê di sala 1999an de, ji aliyekî ve rewşeke din a polîtîk derxist meydanê. Heman salê cara yekem kurdan bi partiyeke xwe ya legal di hilbijartinên herêmî de serkeftineke watedar bi dest xistin. Di serî de şaredariya bajarê mezin a Diyarbekirê, li gelek bajar û navçeyên kurdnişîn partiya HADEP (Partiya Demokratîk a Gel) bi rêjeyeke mezin şaredarî bi dest xistin. Ji aliyekî ve ev rewş, û ji aliyê din ve derketina AKPê (Partiya Edalet û Pêşketinê), biserketina wê di sala 2002yan, têkiliya wê bi Ewropayê re, reform û pêşketinên hem qanûnî û hem civakî yên kirin- di serî de rakirina rewşa awarte li bajarên kurdnişîn-, dîsa çûnûhatinên di navbera dewlet û PKKê de, li gorî salên 1990î serbestiyek derxiste meydanê ku kurd jî di nav vê serbestîye de kar û barên xwe yên çandî, civakî, polîtîk li gor salên berê “hêsanîtir” dikarîbûn bikin. Avakirina saziyên civakî û çandî, û çalakiyên çandî wek lidarxistina mîhrîcanan helbet bandor li ser kurdî û xebatên kurdî jî kirin. Di vî warî de Diyarbekir (an jî bi navê xwe yê di nav kurdan de *Amed*) bûbû wek navenda “huner û çand”ê.[11] Gelek nivîskar, rewşenbîr, şanoger û hunermendên kurd û yên

[10] Li gorî xala 2yemîn ya vê qanûnê, *ji bilî zimanên fermî yê yekemîn ên dewletên ku ji hêla dewleta Tirk ve hatine naskirin, derbîrîn, belavkirin û weşana fikran qedexe* bû. Ji bo qanûnê bnr. https://www.tbmm.gov.tr/tutanaklar/KANUNLAR_KARARLAR/kanuntbmmc066/kanundmc066/kanundmc06602932.pdf (29.03.2018).

[11] Mîhrîcana huner û çandî ya Diyarbekirê ku cara yekemîn di 2001ê de hat lidarxistin mînakek ji van çalakiyan e. Ji bo nûçe û bernameya yekemîn bnr; https://m.bianet.org/bianet/kultur/2517-diyarbakir-sen-ola (08.08.2017); Ji bo nûçeyeke derbarê ya 2yemîn de bnr. https://www.evrensel.net/haber/130902/diyarbakir-da-festival-suruyor (08.08.2017). Helbet ev

din di pêvajoya van mîhrîcan û çalakiyên çandî, hunerî de bi xwendekar û eleqedaran re diketin têkiliyê û vê yekê jî bazareke kurdî derdixist holê û geş dikir. Ev hemû, dikarin wek encamên pêvajoya ku dewleta Tirkiyeyê tê re derbas dibû bên nirxandin. Di vê pêvajoyê de dewlet û têkiliya dewletê bi kurdan re jî diguherî. Di vir de 3 xalên girîng derdikevin meydanê ku li pey hev qewimîn û bandor li ser vê pêvajo û guherînê kirin; Yek jê girtina serokê PKKê Abdullah Ocalan di 1999an de; ya din avakirina AKP (Partiya Edalet û Pêşketinê) û serkeftina wê di hilbijartinên gelemperî yên 2002yan de; û ya din jî şerê kendavê yê duyemîn û bidestxistina statuyeke "fermî" ya Kurdên Iraqê û avakirina "Herêma Kurdistan"ê bû.

Her weha, piştî girtinê daxuyaniyên Ocalan, sekinandina şer bo demekê, balkişandina wî ya li ser "tekoşîna siyasî"; ji aliyê din ve hedef û çalakiyên AKPyê û serokê wê Recep Tayyip Erdoğan, helwestên erênî yên wan derbarê Yekîtiya Ewrûpayê û di vî warî de hewldanên wan; rakirina "rewşa awarte" li bajarê kurdan; gavên di warê "mafê mirovan û demokrasî" de hatin avêtin îzafî be jî rewşeke siyasî ya aram li Tirkiyeyê ava kir ku êdî "kurd" û "kurdî" bêhtir xwe nîşan didan û dihatin xuyakirin. Vê pêvajoyê bi çûnûhatinan heta hilbijartinên 2015an jî dewam kir.

Di vê pêvajoya hatûçûyê û zîz de gavên piçûk û "fedikoyî"- lê bi dîtina min gelekî girîng- hatin avêtin ku wek mînak vekirina qenaleke kurdî di Saziya Radyo û Televîzyona Tirkiyeyê (TRT) de dikare bê dayîn. Bi navê wê yê wî wextî TRT 6 (şeş), ku di 2015an de bû TRT Kurdî, di rêbendan (çile) a 2009an de bi kurdî dest bi weşana 24 saetan kir. Di nav kurdan de kesên ku vekirina vê kanalê wek gaveke baş dîtin jî û yên ku wek amûreke propagandaya dewletê dîtin jî hebûn (Aslan 2015: 160).[12]

Piştî sazkirina TRT 6ê, di dawiya heman salê de, 7ê meha kewçêra 2009an, di lijneya wezîran de biryara vekirina "Enstîtuya Zimanên Zindî" di bin banê Zanîngeha Mardin Artuklu de hat standin. Ev yek di dîroka Tirkiyeyê û kurdên Tirkiyeyê de ji bo ziman, edebiyat û çanda kurdî xaleke girîng bû ku rêya lêkolîn û xebatên akademîk li ber ziman û çanda kurdî vedikir. Tevî hemû kêmasiyan an jî bêderfetiyan, û ligel hemû bertek û rexneyan "beşa kurdî" an jî "kurdolojî" kelecaneke mezin derxist meydanê. Piştî Zanîngeha Mêrdînê, li Zanîngehên din jî hem enstîtu ji bo perwerdeya bilind û hem jî beşên lîsansê hatin damezrandin. Ji ber vê yekê jî mirov dikare avakirina Enstîtuya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Mardin Artukluyê wek destpêka "akademiya kurdî" ya li Tirkiyeyê bi nav bike.

## 2. Serboriya Akademiya kurdî li Tirkiyeyê

Îro di sê Zanîngehên Tirkiyeyê yên li bajarê kurdan de beşên lisansê yên bi navê Ziman û Edebiyata Kurdî yên ku xwendekaran digirin hene ku ew jî Zanîngeha Mardîn Artuklu, Zanîngeha Bîngol û Zanîngeha Muş Alparslanê ne.[13] Her weha, li Zanîngeha Munzur a Tunceliyê (Dersîm) û Zanîngeha Bîngolê beşên Ziman û Edebiyata Zazakî (Zaza Dili ve Edebiyatı) jî hatine vekirin û xwendekaran

çalakî rastî gelek astengiyên fermî jî dihatin. Ji bo mînakekê bnr. http://bianet.org/bianet/kultur/10109-kultur-sanat-festivalinin-yasaklari (08.08.2017).

[12] Her weha ji bo kurteya nêrînên hinek siyasetmedarên kurd bnr. https://www.balcanicaucaso.org/eng/Areas/Turkey/TRT-shesh-44384

[13] Li Zanîngeha Van Yuzuncu Yilê û Zanîngeha Dicleyê jî beş hene lê xwendekaran nagirin.

distînin.[14] Lê, wek li jor jî hatibû gotin, ji “rewşa akademîk” mebest li vir lîsansa bilind e ku ew jî di bin banê enstîtuyan de tê kirin. Ji ber vê yekê jî di vê xebatê de dê bal li ser Zanîngehên xwedî bernameyên lîsansa bilind wekî master û doktora be ku bi giştî di bin banê Enstîtuyên Zimanên Zindî de tên kirin. Divê bê gotin ku ev navlêkirin bi xwe têkiliya “siyaset û beşên kurdî” berbiçav dike; ji xwe di destpêkê de ji bo ku rêvebirên dewletê nedixwest ev dezgeh bi navê kurdan bê tomarkirin û navê “kûrdolojî”yê jî bê bikaranîn.[15] Di dawî de wek çareseriyekê biryara navê *Zimanên Zindî* hat dayîn û ev enstîtu bi vî navî hatin vekirin. Ev yek dikare di çarçoveya nêzîkbûna nêrîna fermî bo kurd û kurdî jî bê şirovekirin, lê ji ber ku ev bi serê xwe mijareke din a berfireh e, li vir dê tenê wek tespîtekê bimîne.

Di dema niha de, “Enstîtuyên Zimanên Zindî” tenê li çar Zanîngehan hene; Mardin Artuklu, Bîngol, Siirt (Sêrt) û Wan Yuzuncu Yıl. Di nav van de ya Zanîngeha Siirtê (Sêrt) tenê wek nav heye lê tu perwerde an jî girtina xwendekaran tune ye û ne aktif e.[16] Li Zanîngeha Dicleyê û Zanîngeha Muş Alparslanê, enstîtu tune ne, lê bernameyên master û doktorayê di bin banê Enstîtuya Zanistên Civakî de tên birêvebirin. Di vê xebatê de bal dê bêhtir li ser “enstîtuyên zimanên zindî” û bernameyên wan be.

### 2.1. Zanîngeh û enstîtu

#### 2.1.1. Zanîngeha Mardin Artuklu; Enstîtuya Zimanên Zindî

Li Tirkiyeyê di sehaya kurdî de perwerdeya lisansa bilind bi Zanîngeha Mardin Artuklu dest pê kir. Di sala 2009an de bi biryara lijneya wezîran “Enstîtuya Zimanên Zindî” hat avakirin û di bin banê vê enstîtuyê de jî di sala 2010an de sê beş, *Ziman û Çanda Kurdî*; *Ziman û Çanda Suryanî* û *Ziman û Çanda Erebî* hatin vekirin.[17] Heta niha beşên kurdî û suryanî aktif bûn, lê di serdema payîzê ya 2017an de beşa Erebî jî xwendekarên lisansa bilind wergirtin.

Beşa Ziman û Çanda Kurdî ji Sibata 2010an vir ve dest bi wergirtina xwendekaran kiriye. Wek bêtez û bitez du bernameyên masterê hene û hejmara wergirtina xwendekaran wek tablo wisa ye;

**Tablo 1:** Hejmara xwendekarên beşa kurdî ya Enstîtuya Zimanên Zindî ya Mardin Artukluyê li gorî salan

| **Xwendekarên yên heta niha hatine wergirtin** | **Yên derçûyî** |
|---|---|

[14] Zanîngeha Munzurê beşa “Zaza Dili ve Edebiyatı”; Zanîngeha Muş Alparslanê “Kürt Dili ve Edebiyatı”;
Zanîngeha Mardîn Artukluyê “Kürt Dili ve Edebiyatı”; Zanîngeha Bîngöl: “Kürt Dili ve Edebiyatı”; “Zaza Dili ve Edebiyatı” Li gorî rêbera tercihan ya OSYM. Bnr. http://dokuman.osym.gov.tr/pdfdokuman/2017/OSYS/LYS/KONTENJANKILAVUZ18072017.pdf 08.08.2017

[15] Ev mijar di nûçe û niqaşên wê demê de dikare bê dîtin. Ji bo mînakekê, bnr. http://www.birgun.net/haber-detay/kurdoloji-yerine-yasayan-diller-e-onay-49707.html 08.08.2017

[16] Ji bo Enstîtuya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Sêrtê bnr: http://yde.siirt.edu.tr/

[17] Ji bo biryara “lijneya wezîran” ya di “rojnameya fermî” ya Tirkiyeyê de hatiye weşandin bnr: http://www.resmigazete.gov.tr/main.aspx?home=http://www.resmigazete.gov.tr/eskiler/2009/12/20091201.htm&main=http://www.resmigazete.gov.tr/eskiler/2009/12/20091201.htm 19.08.2017

| | | |
|---|---|---|
| Kurdî (bêtez) | 890[18] | 860 |
| Kurdî (Bitez) | 227 | 91 |
| Tevahî | 1117 | 951 |

Ev hejmarên di tabloyê de tenê hejmarên xwendekarên bernameyên mastera bitez û bêtez in.[19] Ji bilî van, gelek kes jî beşdarî qursên ziman ên enstîtuyê bune ku hejmara wan kesan jî tenê ji bo kurmancî 1200 kes în û ji wan 50î jî ji bo hindekariya kurdî perwerde dîtine. Li gorî van hejmaran nêzîkî 2500 kes bi awayekî têkildarî perwerdeha enstîtuyê bûne, bi gotineke din di qonaxa akademîyê re derbas bûne. Ligel vê yekê di her dû salên dawî de bi piranî di bernameya bêtez de hejmara xwendekaran kêm bûye (bi rêzê 32 û 50). Çend sedemên sereke ku di nav "pirsgirêk"an de jî dê bên gotin ev in:

Sedema pêşî, bi *fonksiyon*a enstîtu û bernameya mastera bêtez ve girêdayî xuya dike. Di serê pêşî de, enstîtu ji bo "perwerdekirina mamosteyên kurdî" hatibû avakirin. Ji ber vê yekê jî di destpêkê de qederê 2500 kesî serî lê dabû. Bi demê re û bi vekirina beşên lîsansê û her weha dîsa ji ber ku di tayînkirina momasteyan de pêşekî bi xwendekarên lîsansê hat dayîn, enstîtuyê ev fonksiyona xwe ya "perwerdeya mamostetiya kurdî" hêdî hêdî winda kir. Dikare bê gotin ku ji ber vê yekê, hejmara serlêdanan kêm bûye.[20]

Sedemeke din jî şert û mercên siyasî ne ku bandorê li serîlêdanan jî dikin. Ev yek bêhtir bi pêvajoya piştî têkçûna *pêvajoya çareserî*yê û şerê li nav bajaran berbiçav bû.[21]

---

[18] Li gorî rêziknameya nû ya perwerdeya lisansa bilind ya YOKê dema perwerdeya lisansa bilind hatiye sînorkirin. Li gorî vê rêziknamayê xwendekarên bernameya bêtez herî zêde 3 serdema û yên bitez jî herî zêde 6 serdema dikarin bixwînim. Têkiliya xwendekarên ku di van deman de perwerdeya xwe neqedandine ji enstîtuyê tê birîn. Bnr. http://www.yok.gov.tr/documents/10279/23688337/lisansustu_egitim_ve_ogretim_y%C3%B6netmeligi.pdf/8451c3e1-7975-40f1-bc81-3ca01cb288c8 (24.03.2018).
Li Enstîtuya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Mardin Artukluyê jî di serê sala 2018an de têkiliya 285 xwendekaran hatiye birîn. Her weha ji bernameya bêtez 25 û ji ya bitez jî 6 xwendekaran bi xwasteka xwe qeydiya xwe jê birine. Ev hejmar di nav hejmara xwendekaran de nehatiye nişankirin. Tevî van xwendekaran hejmara xwendekarên bitez û bêtez dibe 1433.

[19] Li enstîtuyê ji ber ku zazakî û kurmancî wek zaravayên kurdî tên dîtin hemû xwendekar wek xwendekarên beşa kurdî tên wergirtin. Loma di nav vê hejmarê de xwendekarên ku bi zazakî perwerde dibinin jî cih digirin.

[20] Niqaşên derbarê vê yekê di medyayê de jî cih girtin. Ji bo van nûçeyan du mînak; http://www.radikal.com.tr/turkiye/mardinde-kurtce-ogretmen-adaylarindan-eylem-1102624/ (2012); Nuran Çakmakçı (2012). "Mardin Artuklu ile YÖK Arasında Kürtçe Eğitim Gerginliği", http://www.hurriyet.com.tr/mardin-artuklu-ile-yok-arasinda-kurtce-egitim-gerginligi-21639691 19.08.2017

[21] Bêguman li vir tu danayên istatîstîkî an jî xebateke xweser tune ye; Tesbîta li vir bi giştî li ser çavderiyên nivîskar tê kirin ku di nav de agahiyên ji van çavdêrî û sohbetên xwendekar û mamosteyan jî dihewîne. Wek mînak; dema "qedexeyên li ser navçeyên derdorê, gelek xwendekaran, an jî yên ku bi kurdî ve eleqedar bun digotin ku wan "pirtûkên xwe yên kurdî avetine, an jî birine cihine din"; an jî digotin ku "ew di dema kontrolan de nasnameya xwe ya xwendekariyê pêşî polisan nakin, ji ber ku di wir de beşa "Ziman û Edebiyata Kurdî" dinivîse û ditirsin ku pirsgirêk ji van re derkeve".

Yeke din jî bi rewşa enstîtuyê û Zanîngehê ve girêdayî ye. Li gorî mamosteyên beşê di nav salên borî de hejmara xwendekaran gelekî zêde bûye, lê ligel vê yekê hem derçûn û hem jî hejmara mamosteyan kêm bûye. Ev jî di encamê de barekî li ser mamosteyan bar dike ku ew jî neçar mane hejmara xwendekaran kêm bikin.

Dîsa jî; Beşa Ziman û Çanda Kurdî ya Enstîtuya Zimanên Zindî li Zanîngeha Mardîn Artukluyê ligel hemû pirsgirêk û kêmasîyên xwe îro hîna jî ji bo xwendekarên perwerdeya bilind cihekî girîng xuya dike. Serîlêdanên dawî yên payîza 2017an wek mînaka vê yekê dikare bê dîtin. Li gorî van serlêdanan ji bo mastera bêtez û ya bitez bi tevahî zêdeyî 400 kesî serî lê daye ku mirov dikare wek pîvan û nîşanên eleqeya xwendekarên kurd û her weha eleqeya bi akademiya kurdî binirxîne.[22] Ev yek di heman demê de ji bo enstîtuyên din ên Zimanên Zindî jî derbasdar e. Ji aliyên din, ji bilî Kurdên Tirkiyeyê heta niha (tevî 2017an) ji parçeyên din ên Kurdistanê jî 40 xwendekar beşdarî bernameya masterê ya Enstîtuya Zimanên Zindî ya Mêrdînê bûne. Bi vê yekê jî, dikare bê gotin ku enstîtu dibe mekanekî lihevrasthatina kurd û zaravayên kurdî yên ji parçeyên cuda. Dîsa bi riya enstîtuyê "pêywendî"yek di navbera kurdan de çêdibe ku ev yek ji bo hemû enstîtuyan derbasdar e.

### 2.1.2. Zanîngeha Bîngolê, Enstîtuya Zimanên Zindî

Piştî Zanîngeha Mardîn Artukluyê, di sala 2011an de bi biryara Lijneya Wezîran ku di rojnameya fermî de hat weşandin li Zanîngeha Bîngolê jî *Enstîtuya Zimanên Zindî* hat damezrandin.[23] Enstîtu di sala 2012an de jî dest bi girtina xwendekaran dike. Cudahiya wê ji ya Mardîn Artukluyê ew e ku di Enstîtuyê de ligel Beşa "Kurdî", beşa "Zazakî" jî wek beşeke serbixwe cih digire.[24] Her weha, dîsa di bin banê Enstîtuyê de û ligel Zanîngeha Muş Alparslanê di sala 2016an de di warê "Kurdî" û "Zazakî" de bernameyên doktorayê jî dest pê kirine. Li vir divê bê gotin ku di nêrîna Zanîngehê de "Zazakî" ji zaravayeke kurdî bêhtir wek "ziman"ekî serbixwe tê dîtin.

Ji wexta avakirinê heta niha hejmara xwendekarên hatine standin û yên mezûn bûne, li gorî agahiyên berdest, wek tablo weha dikare bê destnîşankirin;

**Tablo 2:** Bi tevahî hejmara xwendekarên Enstîtuya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Bîngolê

| **Master (bitez û bêtez) yên heta niha hatine wergirtin** | | **Yên derçûyî** | |
|---|---|---|---|
| Kurdî | 129 | Kurdî | 63 |

[22] Divê were gotin ku îsal (2018) ji bo mastera bitez bi tevahî 12 kontenjan hatibûn diyarkirin (6 kurmancî, 3 zazakî û 3 biyanî (kurdên derveyî Tirkiyê) û serîlêdan 167 kes bûn; Ji bo ya bêtez jî 50 kontenjan hatibû diyarkirin û serîlêdan 214 kes bûn. 25 kesan ji bo bernameya bitez a bi zazakî; û 8 kesan jî ji bo kontenjana biyanî serî lê dabûn.

[23] Li gorî pergala perwerdahiya bilind ya Tirkiyeyê, zanîngeh, enstîtu û navendên lêkolînan ên girêdayî zanîngehan bi biryara *Lijneya Wezîran* tên avakirin. Piştî ev biryar di *rojnameya fermî* de tê weşandin, dikeve meriyetê. Ji bo biryara Enstîtuya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Bîngolê bnr. http://www.resmigazete.gov.tr/main.aspx?home=http://www.resmigazete.gov.tr/eskiler/2011/07/20110703.htm&main=http://www.resmigazete.gov.tr/eskiler/2011/07/20110703.htm 19.08.2017

[24] Malpera fermî ya Zanîngehê: http://www.bingol.edu.tr/tr/akademik/enstituler/yasayan-diller-enstitusu/genel-bilgi 19.08.2017

| | | | |
|---|---|---|---|
| Zazakî | 133 | Zazakî | 75 |
| Tevahî | 262 | | 138 |

Her weha, hejmara xwendekarên bernameya doktorayê ku hîna mezûn nedane jî 17 kes in.

### 2.1.3. Zanîngeha Wan Yuzuncu Yilê; Enstîtuya Zimanên Zindî

Enstîtuya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Wan Yuzuncu Yilê piştî ya Zanîngeha Bîngolê di 2012yan de, dîsa bi biryara lijneya wezîran ku 05.12.2012an di rojnameya fermî de hatiye weşandin, hatiye damezirandin û di 2013an de jî dest bi perwerdeyê kiriye.[25] Di 2014an de jî dest bi wergirtina xwendekarên masterê (bitez/bêtez) kiriye. Di Enstîtuya Zimanên Zindî ya Wanê de perwerdeya lîsansa bilind tenê bi zaravayê kurmancî ye. Hejmara xwendekarên heta niha hatine standin û mezûn bûne wek tablo li jêr e:

**Tablo 3:** Hejmara xwendekaran hatine girtin û mezûn bûne yên Enstîtuya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Wan Yuzuncu Yilê

| **Master (bitez û bêtez) yên heta niha hatine wergirtin** | | **Yên derçûyî** |
|---|---|---|
| Bitez | 109 | 41 |
| Bêtez | 150 | 81 |
| Tevahî | 259 | 122 |

Ji bilî van Enstîtuyên Zimanên Zindî yên Mardîn Artuklu, Wan Yuzuncu Yilê û Bîngolê, li Zanîngeha Sêrtê (Siirt) jî Enstîtuya Zimane Zindî hatiye vekirin, lê heta niha xwendekar nestandine û tu çalakiyên wê jî xuya nakin. Ji aliyê din ve li Zanîngeha Dicleyê perwerdeya masterê di bin banê Enstîtuya Zanistên Civakî de tê kirin. Lê, tenê yek mamosteyê beşê heye, û mamosteyên din ku qadroyên wan li beşên wek îlahiyat, hiquqê ne li vir dersan didin. Ligel vê yekê jî dîsa bernameya doktorayê li vê Zanîngehê heye.[26]

[25] Ji bo biryara lijneya wezîran ya di rojnameya fermî de bnr. http://www.resmigazete.gov.tr/main.aspx?home=http://www.resmigazete.gov.tr/eskiler/2012/12/20121205.htm&main=http://www.resmigazete.gov.tr/eskiler/2012/12/20121205.htm û her weha agahiyên derbarê Enstîtuyê de malpera fermî ya enstîtuyê de jî dikare were dîtin. Bnr. https://www.yyu.edu.tr/AkademikBirimler/Sayfalar.php?s=35&Id=608 20.08.2017

[26] Li gorî agahiyên dawî ku ji xwendekar û mamosteyên beşê hatine wergirtin, nivîsandina tezan jî divê bi zimanê tirkî be. Bingeha vê yekê bi rêziknameya 04.06.2017an gire didin (xal 23: bend 18). Ji bo rêziknameyê bnr. http://www.dicle.edu.tr/sosyal-bilimleri-enstitusu-yonetmelik (28.03.2018). Her weha îsal (2017-18) ji bo bernameya doktorayê xwendekar nehatine wergirtin. Ev yek dikare di çarçoveya rewşa polîtîk û guherîna helwestên dewletê û saziyên dewletê li hember beşên kurdî de jî bê nirxandin.

### 3. Pirsgirêkên akademiya kurdî yên berbiçav

Hebûna *enstîtuyên zimanên zindî* ku li ser bingeha beşên kurdî hatine avakirin; di bin banê wan de perwerdeya master û doktorayê; dîsa amadekirina proje û tezan;[27] hem di warê xebatên kurdî de û hem ji bo akademiya kurdî jî pêşketinên watedar in. Ligel van aliyên pozîtîf û baş hinek pirsgirêkên sereke jî hene ku dikarin weha werin destnîşankirin;

- Di vir de jî pirsgirêka sereke ku wek *polîtîk* jî dikare bê binavkirin, *bêstatubûn*a zimanê kurdî ye. Ligel guherînên salên dawî zimanê kurdî li Tirkiyeyê wek fermî nayê naskirin, û her weha ne zimanekî *fermî* ye; hîna jî Kurdî wek zimanek *zindî* tê dîtin û hîna jî statuyeke qanûnî negirtiye; her weha perwerdeya zimanê kurdî ya dibistanan jî *bijarte* ye; ligel ku perwerdeya zarokan bi riya berdibistanan daketiya *salên 4-5an*, perwerdeya kurdî ji *pola 6an* dest pê dike. Ji ber ku ev jî li ser *hilbijartin*a xwendekaran bi rê ve diçe, gelek caran ji ber *kêmbûn*a xwendekaran pol venabin û carina tunebûna mamosteyan dibe pirsgirêk; û gelek caran jî li ser înîsiyatifa gerînendeyên dibistanan dimîne. Ev yek dezavantaja herî mezin a zimanê kurdî ye ku bi awayekî bandorê li akademiyan jî dike.[28]

- Ji aliyê din ve; beşên kurdî û xebatên kurdî, ji ber pêvajoyên tê de derbas bûne *polîtîk* in û her guhertineke polîtîk bandorê li beşan û li xebatên kurdî yên van beşan jî dike ku bi xwe re pirsgirêkan jî derdixe. Wek mînak; piştî hewldana darbeya leşkeri ya 15ê Tîrmehê bi îlankirina *rewşa awarte* re ligel karmendên din gelek mamosoteyên zanîngehan jî ji kar hatin avêtin ku bi giştî bandorê li ser perwerdeya zanîngehan dike. Jikaravêtina mamosteyan valahiyeke mezin derdixê meydanê ku piranî bandor li Beşa Kurdî ya Zanîngeha Mêrdînê kir. Ji beşa kurdî ya Enstîtuya Zimanên Zindî ya Zanîngehe Mêrdînê bi tevahî 6 mamoste û lêkolîner hatin avêtin; û vê dawiyê jî ji Enstîtuya Zimanên Zindî ya Wan Yuzuncu Yilê jî mamosteyek hat avêtin. Ev ji du aliyan ve pirsgirêkan bi xwe re derdixîne;

Yek; valahiyekê û di warê neqilkirina tecrubeyê de *qutkirin*ekê bi xwe re derdixe meydanê; ji ber ku mamosteyên hatine avêtin di hûndirê çend salan de bûbûn xwedî tecrûbe û pisporê sehayekê, avêtina wan di wan sehayan de valahiyek bi xwe re anî. Wek mînak, edebiyata gelêrî, edebiyata zarokan, gramer û edebiyata modern û bi giştî kurdnasî. Ji aliyê din ve avêtina van mamosteyan barê yên mayî zêdetir kir ku êdî ji têketina dersan û şêwirmendiyên tez û projeyan pê de wext nabînin ku tiştekî din bikin. Ligel vê yekê, kadroyên nû jî ji bo van beşan nayên vekirin ku bixwe rê û hêviya kesên master û doktora dikin, digire.

Du; ev pêvajoya jikaravêtinê zextekê li ser mamosteyên mayî çêdike û bi gelemperî bi xwe re sansûr û oto-sansûrekê jî tîne. Ji ber vê yekê jî êdî mamoste divê li hal û hereketên xwe û gotinên xwe bêhtir baldar bin. Ev yek bêguman

---

[27] Ji bo xebateke derbarê tezên masterê yên kurdî ku di bin banê Enstîtuyên Zimanên Zindî de hatine amadekirin bnr. Aykaç, 2017. Dîsa tenê di beşa kurdî ya Enstîtuya Zimanên Zindî ya Mêrdînê de heta niha zêdeyî 400 projeyên bêtez ku bi kurdî (kurmancî-zazakî) û mijarên wan curbecur in, hatine amadekirin.

[28] Hêjayî gotinê ye ku pirtûkên van polan jî ji aliyê lijneyeke mamosteyên Zanîngeha Mardin Artuklu ve hatine amadekirin. Ev yek ji bo "standartbûna kurdî" jî di warê akademiya kurdî gaveke girîng e. Bnr: K. Yıldırım, A. Adak, H. Acar, T. Aydin, M. Tayfun, R. Çeçen, M. Bülbül, Z. Ergün, İ. Bingöl, R. Pertev, KURDÎ 5, 6, 7 KURMANCÎ, MEB; Heman lijne, KURDÎ 5, 6, 7, ZAZAKÎ, MEB.

bandorê li hemû akademiya Tirkiyeyê dike, lê ji ber ku kurdî bi serê xwe qadeke *polîtîk*e, ev *polîtîkbûn* bêhtir bandorê li akademiya kurdî dike.

- Her çiqasî bi navê *Ziman û Edebiyata Kurdî* beş hebin jî, girtina kar a mezunên ji van beşan kêm e. Her çiqasî heta niha hejmareke gelek kêm bêkar mabe jî, li gor rêjeya girtina mamosteyan dibe ku siberojê ev xwendekar bêkar bimînin; ev yek jî dibe ku bandorê li ser hilbijartina beşên ziman û edebiyata kurdî bike.

- Tiştekî din ku wek pirsgirêk bê binavkirin jî kêmbûna akademîsyenên jin di akademiya kurdî de ye. Ev yek bêguman pirsgirêkeke giştî û her weha mijareke serbixwe ye ku hêjayî xebateke serbixwe ye.

- Her çiqasî di hinek komxebat an jî civînan de ligel hev rûnin jî, konsensusek, lihevhatinek an jî lihevrûniştinek di navbera enstîtuyan de xuya nake. Ji ber vê yekê jî bernameyeke hevpar dernakeve meydanê.

- Ligel ku sê enstîtuyên zimanê zindî û li van enstîtuyan jî perwerdeya master û doktorayê heye jî, çalakî û platformên akademîk wek sempozyum, kongre ku akademisyenên kurd li hev bicivîne gelekî kêm in. Ev yek wate û girîngiya hebûn û zêdebûna weşangeriya akademîk, yanî kovarên akademîk, ji bo avakirina platformeke akademîk zêdetir dike.

**Encam**

Serboriya akademiya kurdî û pirsgirêkên wê bi giştî têkildarî rewşa civakî, polîtîk û akademîk ya Tirkiyeyê ne. Li Tirkiyê ji ber îdeolojiya netewper ya dewletê heta salên 1990î jî nasnameya kurd nedihate naskirin û qedexe li ser zimanê kurdî hebû. Ji ber heman sedemê di akademiya ya Tirkiyeyê de jî xebatên *zanistî* û *objektif* derbarê ziman, çand û edebiyata kurdî de nedihatin kirin û yên dihatin kirin jî di çarçoveya îdeolojiya serdest a dewletê de bûn. Ên ne di vê çarçoveyê de bûn jî rastî zextên dadgehî dibûn. Bi heman sedemê ve têkildar xebatên kurdî li derveyî akademiye dihatin kirin û bi vê yekê ve girêdayî gelek caran ji rêbaz û nêrîna zanistî dûr bûn. Loma li Tirkiyeyê di qada xebatên kurdî de xebatên akademîk nehatin kirin û her weha akademiyeke kurdî jî derneket holê.

Di salên 1990î de bi guherînên siyasî ve têkildar xebatên derbarê ziman, edebiyat û çanda kurdî de jî zêde bûn, weşanxane hatin vekirin, kovar hatin çapkirin, sazî hatin damezrandin. Bi riya van sazî, weşanxane û kovaran, kurdên Tirkiyeyê ji xebatên zanistî yên ji aliyê biyaniyan ve hatine kirin agahdar bûn. Her weha ji salên 2000î û wir de di akademiyên Tirkiyeyê de jî xebatên li ser kurdan û kurdî tên dîtin. Ev xebat di beşên curbecur de bi zimanê tirkî dihatin kirin. Ji ber vê yekê di warê xebatên zanistî yên derbarê ziman, edebiyat û çanda kurdî bi zimanê kurdî de damezrandina Enstîtuyên Zimanên Zindî wek kêlikekê dikarin bên nirxandin.

Her weha, ligel enstîtuyên Zimanên Zindî ku li ser beşên Kurdî ji bo perwerdeya bilind hatine avakirin, beşên ziman û edebiyata kurdî yên lîsansê jî hatin damezrandin û dest bi wergirtina xwendekaran kirin. Hem di beşên lîsansê de hem jî di beşên lisansa bilind de îro gelek xwendekarên derçûyî hene ku tez û projeyên xwe yên qedandinê di sehayên wek ziman, edebiyata klasîk, edebiyata gelêrî û edebiyata modern de bi zimanê kurdî amade kirine. Ev beş, xwendekar, tez û projeyên li van enstîtuyan hatine amadekirin tev rê didin ku mirov li Tirkiyeyê behsa akademiyeke kurdî bike. Ji ber ku akademî ew mekân in ku li gorî standartên zanistî yên cihanî bernameyên perwerdeyê bi rê ve dibin û di encamê de jî pisporên wê sehayê derdixin meydanê. Li gorî vê yekê, bi serê xwe hebûna

van saziyan û di bin banê wan de perwerdeya xebatên kurdî bi zimanê kurdî rê dide ku ev sazî û civak wek akademiya kurdî bê binavkirin. Datayên berdest jî vê yekê destnîşan dikin.

Li gorî datayên ji enstîtuyan hatine wergirtin xuya dibe ku heta niha zêdeyî 2000 kes bi giştî di warê xebatên kurdî de di pêvajoya perwerdeya zanistî re derbas bûne û ev hejmar her sal zêdetir dibe. Ev yek ji bo xebatên kurdî li Tirkiyeyê wek pêşketineke mezin û ligel vê yekê jî wek *destpêka akademiya kurdî* jî dikare bê dîtin. Di van enstîtuyan de bi giştî di çar beşên sereke yên qada kurdî de tez û proje hatine amadekirin ku ew jî; *edebiyata klasîk*, *edebiyata gelêrî*, *edebiyata modern* û *ziman* in. Her çiqasî mijarên sereke ev bin jî di salên dawî de mijarên girêdayî folklore û ên nav-disîplînî wek sinema, mûzîk û dîn jî hin bi hin derdikevin meydanê ku ji bo pêşeroja akademiya kurdî û pêşketina wê jî hêviyekê bi xwe re tînin.

Lêbelê, ligel vê pêşketinê hinek pirsgirêk û kêmasî jî hene ku yek jê kêmbûna mamoste û pisporan e. Her weha wergirtina qadroyên nû jî li gorî destpêka damezrandina esntîtuyan kêm bûye ku wek pirsgirêkeke têkildarî rewşa siyasî jî dikare bê dîtin.

Kêmbûna têkiliyên di navbera enstîtuyan de jî wek pirsgirêkeke din a akademiya kurdî dikare bê dîtin ku bi xwe re kêmasiya bernameyeke hevpar jî tîne. Her çiqasî hinek hewldan hebin jî ev têkilî hîna ne di wê astê de ne ku bernameyeke hevpar derbixê meydanê.

Bêguman ev kêmasî û pirsgirêk encax bi riya çalakî û platformên akademîk wek sempozyum, kongre û weşanên kovarên akademîk dikarin bên çareserkirin ku di heman demê de dibin platformên hevnaskirinê ji bo akademîsyenan jî. Lêbelê di warê xebatên kurdî de kêmbûna çalakiyên akademîk jî wek pirsgirêkekê xuya dibe ku ew jî dîsa di çarçoveya têkiliya di navbera enstîtuyan dikare bê nirxandin.

Ji aliyê din ve dikare bê gotin ku pêşketina enstîtuyan û zêdebûna xebatên akademîk rê li ber hinek pêşketinên din vekiriye ku mînaka herî girîng û berbiçav kovarên akademîk in. Li vir divê bê gotin ku ev têkiliyeke dualî ye û hebûn û pêşketina wan bandore li her du aliyan dike.

Di nav vê serboriya akademiya kurdî ya li Tirkiyeyê de, tevî van pêşketin, pirsgirêk û kêmasiyan wek encam dikare bê gotin ku *akademiya kurdî* li Tirkiyeyê hîna di asta *destpêk*ê de ye û û pêdîviya wê bi alikariya civak(ên)a akademiya kurdî ya giştî heye.

**Çavkanî:**

Afet, İ. (1930). Türk Tarihinin Ana Hatları, İstanbul: Devlet Matbaası

Akkaya, A. H. (2013). Kürt Hareketi'nin Örgütlenme Süreci Olarak 1970'ler. *Toplum ve Bilim*, sayı. 127. Ji vê malperê hatiye daxistin: https://biblio.ugent.be/publication/4109742/file/6801640 09.09.2017

Alış, A. (2010). Üç Devrin Tanığı: Modern Kürt Siyasi Tarihinin İçinden Musa Anter'i Okumak. *www.birikimdergisi.com*. http://www.birikimdergisi.com/guncel-yazilar/882/uc-devrin-tanigi-modern-kurt-siyasi-tarihinin-icinden-musa-anter-i-okumak#.WaJ_BfhJbIV 26.08.217

Anter, M. (1999). *Hatıralarım*. Stenbol: Avesta.

Aslan, S. (2015). *Nation-building in Turkey and Morocco: Governing Kurdish and Berber Dissent*. New York: Cambridge University Press.

Aydın, S. (2000). *Modernleşme ve Milliyetçilik.* (2. Bsk). Ankara: Gündoğan

Aykaç, Y. (2017). Bîbliyografyaya Tezên Beşên Kurdolojiyê Yên Li Tirkiyeyê (2011-2016). *The Journal of Mesopotamian Studies*, vol. 2, no.1, r. 119-135.

Baltes, M. (1993). Plato's School, The Academy. *Hermathena*, No. 155 (Winter 1993), pp. 5-26 https://www.jstor.org/stable/pdf/23041030.pdf 17.12.2017

Beltekin, N. (2014). *Okul ve Öteki Yurttaşlar: Kürt Politik Aktörlerin Eğitimsel Deneyimleri*. İstanbul: Wate

Beşikçi, İ. (1986). *Türk Tarih Tezi ve Kürt Sorunu*. 2. Bsk. Stockholm: Dengê Komal.

Beşikçi, İ. (2014). *Doğu Mitingleri Analizi (1967)*. İstanbul: İBV yayınları.

Beşikçi, İ. (2011/2017). Hapisteki DDKO, Doğu Devrimci Kültür Ocakları. https://ismailbesikciyazilari.wordpress.com/2011/04/08/hapisdeki-ddko-devrimci-dogu-kultur-ocaklari-ismail-besikci/ 24.11.2017

Bozarslan, H. (2013). Önsöz: Türkiye'de Kürt Sol Hareketi. Di nav: *Kürdistan Sosyalist Hareketi: 60'lardan 200'lere Seçme Metinler* (ed. E. A. Türkmen & A. Özmen), Ankara: Dipnot, pp. 9-69.

Çakmakçı, N. (2012/2017). Mardin Artuklu ile YÖK Arasında Kürtçe Eğitim Gerginliği. http://www.hurriyet.com.tr/mardin-artuklu-ile-yok-arasinda-kurtce-egitim-gerginligi-21639691 19.08.2017

Çal, G. (2014). *Kürt Siyasal Hareketinde Devrimci Doğu Kültür Ocakları Deneyimi (1969 – 1971).* Teza masterê a neçapbûyî. Bidestxistin: acikarsiv.ankara.edu.tr/browse/26494/tez.pdf (25.11.2017)

Kaya, H. (2012). *Doğu'nun Elçisi'nden Yüce Divan'a Şerafettin Elçi* (röporaj), İstanbul: Fanos yayınları

Malmîsanij & Lewendî, M. (1992). *Li Kurdistana Bakûr û Li Tirkiyê Rojnamegeriya Kurdî (1908-1992).* Ankara: Öz-Ge

Malmîsanij, M. (2007). *The Past and the Present of Book Publishing in Kurdish Language in Turkey and Syria*. İstanbul: Wate

Sungur, E. (2007). *Barzan'dan Bağdat'a Kürtler*. İstanbul: Doz yayınları

Türkmen, A. E. & Özmen, A. (amd.) (2014). **Kürdistan Sosyalist Solu Kitabı, 60'lardan 2000'lere Seçme Metinler. Ankara: Dipnot Yayınları**

**Vergin, N. (1999). Bilim Camiası ve Tanınma İsteği. Doğu Batı Düşünce Dergisi, Yıl: 2, Sayı: 7, ss.43-61.**

Yıldırım, K. & Adak, A. & Acar, H. & Aydin, T. & Tayfun, M. & Çeçen, R. & Bülbül, M. & Ergün, Z. & Bingöl, İ. & R. Pertev (2016). KURDÎ 5, 6, 7 KURMANCÎ, (çapa 5emîn), Ankara: MEB; Heman lijne, KURDÎ 5, 6, 7, ZAZAKÎ, Ankara: MEB.

**Malper:**

**Malperê Enstîtuyan:**

http://www.artuklu.edu.tr/yasayan-diller-enstitusu

http://www.bingol.edu.tr/tr/akademik/enstituler/yasayan-diller-enstitusu/genel-bilgi

https://www.yyu.edu.tr/AkademikBirimler/index.php?s=35

http://yde.siirt.edu.tr/

**Yên din:**

https://www.etymonline.com/word/academy 21.12.2017

https://en.oxforddictionaries.com/definition/us/academy 21.12.2017

http://www.anayasa.gen.tr/1921-tek-orijinal.pdf 12.08.2017

http://www.anayasa.gen.tr/1924tek.htm 12.08.2017

http://www.adalet.gov.tr/duyurular/2011/eylul/anayasalar/1982.pdf 12.08.2017

https://m.bianet.org/bianet/kultur/2517-diyarbakir-sen-ola (08.08.2017)

https://www.evrensel.net/haber/130902/diyarbakir-da-festival-suruyor (08.08.2017)

http://bianet.org/bianet/kultur/10109-kultur-sanat-festivalinin-yasaklari (08.08.2017)

https://www.balcanicaucaso.org/eng/Areas/Turkey/TRT-shesh-44384

http://dokuman.osym.gov.tr/pdfdokuman/2017/OSYS/LYS/KONTENJANKILAVUZ18072017.pdf 08.08.2017

http://www.birgun.net/haber-detay/kurdoloji-yerine-yasayan-diller-e-onay-49707.html 08.08.2017

http://www.radikal.com.tr/turkiye/mardinde-kurtce-ogretmen-adaylarindan-eylem-1102624/ (2012)

http://www.resmigazete.gov.tr/main.aspx?home=http://www.resmigazete.gov.tr/eskiler/2009/12/20091201.htm&main=http://www.resmigazete.gov.tr/eskiler/2009/12/20091201.htm 19.08.2017

http://www.resmigazete.gov.tr/main.aspx?home=http://www.resmigazete.gov.tr/eskiler/2011/07/20110703.htm&main=http://www.resmigazete.gov.tr/eskiler/2011/07/20110703.htm 19.08.2017

http://www.resmigazete.gov.tr/main.aspx?home=http://www.resmigazete.gov.tr/eskiler/2012/12/20121205.htm&main=http://www.resmigazete.gov.tr/eskiler/2012/12/20121205.htm

http://www.yok.gov.tr/documents/10279/23688337/lisansustu_egitim_ve_ogretim_y%C3%B6netmeligi.pdf/8451c3e1-7975-40f1-bc81-3ca01cb288c8

http://www.dicle.edu.tr/sosyal-bilimleri-enstitusu-yonetmelik